Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

PDK-S Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriya 1957

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (258) | Çileya Pêşîn / 01-12-2023

# Bacên grûpên çekdar rewşa cotkarên Efrînî zehmet kiriye



Kurdistan

Di dema dawî de, cotkarên Efrînê bi zêdebûna nirxê tenekeya zeyta zeytûnan kêfxweş bûn ku gihişte zêdetirî 90 dolarên Emerîkî, lê bacên sepandî ji aliyê grûpên çekdar ve rewşa wan zehmet kiriye, îsal beramber salên derbasbûyî, grûpên çekdar bac 300% li ser berhemanîna zeytûnan yên ku xwedanên wan ne li wir in zêde kiriye, û rêje ji cihekî bo cihekî din tê guhertin.
Li gor bidûvçûneke ARKê, grûpa Silêman Şah"Emşat" li gundên di jêr destê wan de li Mabata û Şiyê, 20 dolar li ser her darekê ferz kirine ku xwedanên wan ne li wir in, û wekîlên wan karûbarên wan birêve dibin, sala par tenê 4 dolar ji bo her darekê dihate wergirtin.
Li gor jêderên ARKê pişta xwe bi wan ve girê daye, ew koçberên li kampên Şehba ne ji berhemên xwe bêparin, û nikarin di riya wekîl ya merivên xwe re berhemên xwe biçinin, bi hinceta ewên li wan kampan dimînin alîgirên rêveberiya PYDê ne. Hejmara darên koçberan bê penaberan li navenda Nahiya Şiyê derdora 275 hezar darên zeytûnan e.
Wan jêderan tekez kirine, cotkar neçarin her serê darekê dolarekî bidin, û dema berhemanîna zeytê 5 ji sedî yekser didin, û li her kargeheke guvaştina zeytûnan du wekîlên Emşat hene çavdêriya berhemên kargehan dikin ji bo bidestxistina bacan.
Bacên li ser hin gundan ji bo vê salê:
Navenda Nahiya Şiyê, gujmê bacan derdora Milyon û 100 hezar dolar e.
700 hezar dolarên Emerîkî li ser gundê Senarê
700 hezar dolarên Emerîkî li ser gundên Çeqela ku 3 gund in, Jêrîn, Jorîn û Ortê
600 hezar li ser gundê Anqelê
500 hezar li ser navenda navçeya Mabeta
300 hezar li ser gundê Hisê
300 hezar li ser gundê Hêkêçê
200 hezar li ser gundê Aşka Rojhilat
20 hezar dolarên li ser gundê Xelîl
16 hezar dolarên Emerîkî li ser gundê Alkana
Nivîsîngeha Wezareta Berevaniya Hikûmeta Sûriyê ya Demkî di daxuyaniyekê de tekezî li ser parastina baxên zeytûnan li Efrînê kiribû, û ragihandibû, parastina darên zeytûnan ji karê sereke yê Artêşa Niştîmaniya ya bi ser wê ve ye.
Li gor wê daxuyaniyê, ji sala 2018an ve derdora 187 hezar dar zeytûn ji bo xwedanên wan hatine vegerandin, herwiha derdora 20 hezar donim zevî jî ji bo xelkê hatiye vegerandin.
Roja 23-11-2023an, Desteya Giştî ya Îtîlafa Sûriyê di daxuyaniya piştî civata xwe ya 69emîn tekez kir, ku pêwîste kesên binpê kirin derheqê sivîlan de kirine bêne sizadan, û tenê bac ji aliyê Wezareta darayî û abûrî ve têne destnîşan kirin.

## Jiyana zehmet ya welatiyan

Li Kurdistana Sûriyê rewşa aborî ya zehmet êdî bûye sedema sereke ji hejariya welatiyan ku gelek zehmetiyan di dabînkirina pêwîstiyên jiyana xwe yên rojana de dibînin. Di çarçoveya krîza sotemeniyê ya ku hemû herêmên Kurdî heye berdewam dike, xelk neçarin di rêzên dirêj de ta çend demjimêran bisekinin li pêşiya benzînxaneyan ji bo bidestxistina çend lîtir mazot an jî banzînê.

*Rû—2*




**Tundiya dijî jinan tawaneke mezin e**

*Rûpel—3*

**Bersivek bo Diyar Dêrsim**

*Rûpel—3*

**Danya Mardînî.. Rengên hunerî têne guhestin, û her cûre bi rengekî bêhempa ye û me dikişîne nav cîhana xwe**

*Rûpel—4*

# Kurdistana Sûriyê.. Hêviyên welatiyan û astengiyên jiyanê

Hêvî Delî-Qamişlo

Li Kurdistana Sûriyê rewşa aborî ya zehmet êdî bûye sedema sereke ji hejariya welatiyan ku gelek zehmetiyan di dabînkirina pêwîstiyên jiyana xwe yên rojana de dibînin, taybet weku kirîza nan û xazê û birîna avê û qutbûna elekitrîkê ku ji destpêkirina şoreşa Sûriyê di sala 2011an de derketine holê, û ev yek bê guman dibe cihê gilî û gazinên xelkê, û him dibe sedema koçberî û derbederbûna xelkê, him dibe sedema zêdebûna rêjaya hejariya welatiyan ku ew nikarin pêdeviyên xwe bi awayekî giştî bi dest bixin.

Welatiyek ji niştecihên bajarê Qamişlo derbarê rewşa jiyana ku têde derbas dibin li Kurdistana Sûriyê wiha ji Rojnemaya Kurdistan re dibêje: "Roj bi roj rewşa xelkê pir zehmet û aloz dibe ji ber sedemên cuda bi taybetî rewşa ewlehî û kirîzên heyî û ji aliyekî din ve, bêqîmetbûna lîreya Sûrî li berembetî dolarê Emerîkî, ku bandoreke mezin li ser aboriya Sûriyê bi giştî kiriye, û bi taybet navçeyên Kurdî, ev yek dibe sedema buhabûna nirxên hemû alavan û kerestên xwarinê, û rêjeya kirîn û firotinê pir aloz kiriye û liv û tevgera xelkê di nava bazarê de kêm dibe, û bandora wê ya neyînî jî gelek xirab e li ser rewş û jiyana kesên belengaz ku tûşî astengiyan tên ji bo peydakirin û dabînkirina xizmetguzariyên pêwîst ji nan û xazê û xwestekên malbatên xwe yên rojane, û kesên ku karê rojane dikin kêm mûçe ne û dibin hêla hejariyê de dijîn, bi vî awayî ew nikarin bi nirxê bilind pêdeviyên zarokên xwe ji kelûpelên pêwîst bidest bixin û jiyana bi xweşî derbas bikin, taybet ku ew niha di werzê zivistanê de ne, û kar jî nîne.Vî welatî amaja bi wê yekê kir, hewcedariya wan bi madeya mazot û kirîna sopeyên germkirinê jî heye ku li bajarê Qamişlo nirxê her sopeyekê ji 18 dolaran ta 700 dolarên Emerîkî ye, ev yek jî dibe pirsgirêkeke di qeyrana aborî ya dijwar de.

> **Nebûna xizmetguzariyan dibe sedema koçberiyê**

Ji aliyekî din ve, gazindin welatiyan derbarê astengiyên li pêşiya wan derdikevin, yek ji wan nebûn û bilindbûna nirxê dermanan li Kurdistana Sûriyê ye, li ser vê mijarê welatiyê bi navê Ferhad Reşîd ji Rojnameya Kurdistan re wiha got: Kirîza bilindbûna nirxê dermanan li Kurdistana Sûriyê, bûye diyardeyeke nebaş li ser jiyana welatiyan derbarê buheyê nirxê derman û nebûna gelek coreyên wan li dermanxaneyan, pirsgirêkê li cem nexwaşan çêdike, ku gelek dermanên nexwaşiyên giran wek Şekir û Penceşêr peyda nabin heger peyda bibe ew jî bi nirxekî zêde tê firotin, her li gorî xwediyên dermanxaneyan dibêjin, bilindbûna dolar bandor li wan tê kirin ji ber vê yekê ew neçarin nirxê dermanan buha bikin. Jibilî kirîza aborî êdî xelk li hemû deverên herêmên Kurdî li Kurdistana Sûriyê, gazindên xwe dikin ji birîna avê û qutbûna elektirîka niştîmanî û ev yek di nav welatiyan de nîşaneyên pirsê çêdike, taybet ku kehreb çavkaniya sereke ya enerjiyê ye û li hin bajaran bîrên ava vexwarinê girêdayî bi kehrebê ve ye, ji ber vê yekê li her taxakê jeneratorê elektirîkê taybet hatine danîn û her çend mehan nirxê empêran tê guhertin û bilind dikin, û niha nirxê her empêrek 13 hezar lîreya Sûrî li hemberî 8 demjimêran di rojê de, lê elektirîka jeneratoran pêdeviyên xelkê peyda nake, ji ber buhayê bilind zêdetirî 2 heta 6 empêran nikarin bikşînin, û ev yek jî barê li ser milê welatiyên hejar giran dike.

Di çarçoveya krîza sotemeniyê ya ku hemû herêmên Kurdî heye berdewam dike, xelk neçarin di rêzên dirêj de ta çend demjimêran bisekinin li pêşiya benzînxaneyan ji bo bidestxistina çend lîtir mazot an jî banzînê wergirin çi ji bo otomobîl û çi ji bo germkirinê be, niha werzê zivistanê ye û pêwêstiya wan zêde bi mazotê heye, û herwiha ev yek bandorê li karê wan jî dike di demekê de ku niştecîyên herêmê rastî qeyrana jiyana zehmet û dijwar de dijîn ji encama daketina lîreya Sûrî li hember dolarê Emerîkî.

> **Buhabûna nirxê mazotê rewşa welatiyan xerabtir kiriye**

Li gorî hatî zanîn, ji Tebaxa îsal ve komîteya Sotemeniyê ya bi ser rêveberiya PYD ve bi rêya kertên taybet bi madeya mazotê li ser her malbatekê 300 lîtir mazot belav kirine, lê ev tê wateya di werzê zivistanê de û di keş û hewaya sar de, xelkên bajêr dibêjin ku ev lîtreyên mazotê têra wan nake.

Ji encama têkçûna rewşa xirab a aborî digel êş û azarên milet, rêveberiya PYDê di Îlona borî de, nirxê mazotê bilind kir, lê ev yek bû cihê nerazîbûna welatiyan êdî li seranserê herêmên Kurdî ji Qamişlo, Kobanê, Dêrikê, Girkêlegê, xelk li dijî biryara PYDê rabûn û xwepêşandanên aştiyane lidarxistin, û nerazîbûna xwe nîşan dan, dan zanîn biryar û siyaseta PYD dibe sedema welatî koçber bibin û hêviya milet ew e ku zûtirîn dem de çareserî ji van pirsgirêkan re were dîtin û ew bi aramî û xweşî bi moralên geş jiyana xwe bijîn.






# Tundiya dijî jinan tawaneke mezin e

Kurdistan



Tundiya li dijî jin û keçan yek ji binpêkirinên herî belavkirî ye yên mafên mirovan li cîhanê. Tê texmîn kirin ku li cîhanê 736 milyon jin - ji sê jinan yek - herî kêm carekê di jiyana xwe de bûne qutrbaniya tundiya fizîkî û sêksî. Ev belayek e ku li hawîrdorên cihêreng, di nav de cihên kar û cihên serhêl zêde bûye, û ji ber bandorên piştî nexweşiyan ên pevçûn û guherîna keşûhewayê zêde bûye. Çareserî bi giranî di bersivên xurt de ye ku di pêşîlêgirtinê de weberhênan dike. Lê belê, çavkaniyên aborî yên hindik ên ku ji hêla welatan ve têne veqetandin cihê dilgiraniyê ne. Tenê %5 alîkariyên hikûmetên cîhanî ji bo rûbirûbûna li dijî tundiya li ser jinan tê veqetandin û kêmtirî %0.2 ji bo pêşîlêgirtina wê tê terxankirin. Pêdiviya zêdetir bi çavkaniyên aborî ji bo rêxistinên jinan, başkirina yasa û bicihanîna dadmendiyê, xizmetguzariyên ji bo rizgarbûyan û perwerdekirina karmendên yasayê heye.Tundûtûjiya li dijî jin û keçan yek ji binpêkirinên herî berbelav, berdewam û wêranker ên mafên mirovan e di cîhana me ya îro de, û ji ber bêcezakirin, bêdengî û stema li derdora wê bi piranî nayê zanîn. Bi giştî tundî bi awayên fizîkî, zayendî û psîkolojîk derdikeve holê û di nav de:
Tundiya ji nêzîk ve (lêdan, îstixlala psîkolojîk, destavêtina zewacê, kuştina jinan).
Tunndiya zayendî (hevjîniya bi zorê, kiryarên zayendî yên bi darê zorê, pêşkeftinên cinsî yên nedilxwaz, îstixlala zayendî ya zarokan, zewaca bi darê zorê.
Bazirganiya mirovan (koletî û îstixlala zayendî
Sinetkirina jinan,
Zewaca zarokan.
Tundiya li ser jinan pirsgirêkeke sereke ya tenduristiya giştî ye ku bingeha wê ji newekheviya zayendî heye û binpêkirineke mezin a mafên mirovan ên jinan e û bandorê li jiyan û tenduristiya bi milyonan jin û keçan dike. Bi armanca bidawîkirina tundiya li ser jinê, pakêta "Rêzgirtin – Pêşîlêgirtina tundiya li Ser Jinê: Çarçoveyek ji bo Siyasetvanan" hat amadekirin, li ser bingeha Çarçoveya tundiya li Dijî Jinê ya Neteweyên Yekbûyî ya sala 2015an û delîlên nû û nûjen. Di pakêtê de di vî warî de nîgaran hene.

# Bersivek bo Diyar Dêrsim



Şêxo Efrînî

Hevalekî min li ser torên civakî Facebookê, perçevîdiyoyek ji min re şand, min vekir û lê guhdar kir, perçevîdiyo ya hunermend Diyar Dêrsim bû, di çend xulekan de ji bilî jehrê ji devê wî dernediket, min got ka ez tekez bikim ku ev axaftin nû ye yan kevin e, piştî min lêgerînek di kenal û malperên PKK'ê de kir, min piştrast kir ku nû ye li ser kenaleke wan belav bûye.
Di lêdwana xwe de, Diyar ne li ser straneke, helbesteke yan sazekê diaxive û rexne dike, lê belê zimandirêjî û destêwerdaneke tûj û bê sûd di siyasetê de dike û gotina ku jê hatiye xwestin dike.
Bêguman ji mafê her kesekî ye ku rexneyan bigire, lê dema ji sînorê xwe derkeve, wê demê dibe zimandirêjî û bêrewiştî. Diyar di lêdwana xwe de rexneyan li hebûna xalên leşkerî yên Tirkiyê li Herêma Kurdistanê digire, û Partiya Demokrata Kurdistanê PDK'ê bi "xiyanetkar" bi nav dike.
Yekem tişt, ka em bi hev re li sedemên hebûna Tirkiyê li Herêma Kurdistanê binêrin, ma ne hebûn û destêwerdana PKK'ê di karûbarên hundirîn yên herêmê de bûne sedema sereke ji hebûna Tirkiyê, eger PKK'ê neba, gelo Tirkiyê dikarî bostekê derbas bibe?
PKK'ê, ku Bakurê Kurdistanê avêtiye paş milê xwe, hatiye li Herêma azad xwe kiriye enter û zendbadayî, şerê xwe bi Tirkiyê re ragihandiye, çima venagere çiyayên Bakur, ma ne çiyayên Bakur ji yên Başûr bilindtir û asêtir in. Te heta niha çima bostek li Bakur rizgar nekiriye, û tu dixwazî herêmeke azad têk bidî û qewereya wê ji nav bibî! Ev Kurdayetî ye?
Ma gelo PDK'ê bû, yê ku xiyanet li Efrîn û 7 navçeyên wê û 360 gundan sala 2018'an kiriye? Ma gelo PDK'ê xiyanet bi Serêkaniyê û Girêsipî sala 2019'an kiriye? Ma gelo PDK'ê xiyanet li 600 gundên başûr kiriye, ku şêniyên wê nikarin vegerin ser zêdên xwe? Ma gelo PDK'ê xiyanet bi 25 hezar ciwanên Kurd li Rojavayê Kurdistanê kiriye ku ji ber bajarê Ereban wek Reqa, Dêrazorê, Til Rifetê, Munbicê dane kuştin û birîndarkirin?
Ma PDK'ê bû bi hezaran zarokên Kurdan bo leşkeriya neçar revandiye û dayikên wan kezebşewitî hiştine? Ma PDK'ê, rûpela Kurdan li ser asta cîhanê çi navdewletî û navnetewî be reş kiriye, û bi terorê ve girê daye?
Ev tenê cend xal in, me behs kiriye, eger em bidin pey hev, pirtûk û roman têrê nakin, dîsa jî Diyar, ev yek avêtiye paş guh xwe û hatiye gotinên elaş û belaş li ser hilgirên doza Kurdî û parêzvanên Kurdistanê dike.
Bi sedan dosye, tawan û binpêkirin hene ku hin ji wan têne gotin û hin jî nayên gotin di stûyê PKK'ê de ne, lê xwe bêguneh derdixe û welatparêz û niştîmanperwerên dilsoz weke PDK'ê xayîn derdixîne. Kesên weke Diyar li ser van felaketan bêdeng in.
Hunermend divê bi erkê xwe di gihandina êş û azarên miletê xwe, bi deng û helbestên xwe bigihîne cîhanê, ne fitnê û bêbextiyê bike.
Herêma Kurdistanê bi Hikûmeta xwe ve, di distûrê de danpêdankirî ye, azad e, serbest e, lê 3 perçeyên din bidest in, nayê hişê mirovan ku tu 3 perçeyan bihêlî û cihê xwe li Herêma azad germ bikî, eger tu ewqas merd û mêrxas î, kerem bike here qada xwe li Bakur şer bike. Hêzên Pêşmergeyên qehreman hene ku Herêma Kurdistanê diparêzin û dê biparêzin, pêwîst nake tu bimînî, eger tu çû wê demê, tu behaneya Tirkiyê jî namîne, dê neçar bibe derkeve.
Ez bi hêvî me Diyar Dêrsim ked û berhema xwe bi van lêdwan û daxuyaniyên jehirkirî têk nede, dîsa jî emê tekez bikin ku rexnegirtin ji mafê hemûyan e, lê nebe zêdegavî û neşêrînî, tu dikarî partiya ku, dilê te jê re rihet dibe, hilbijêrî, lê tu nikarî rastiyan bincil û berûvajî bikî.

# Danya Mardînî.. Rengên hunerî têne guhestin, û her cûre bi rengekî bêhempa ye û me dikişîne nav cîhana xwe



Mahir Hesen-Elmanya

Keçek ji Amûdê bi temen xwe piçûk e, lê bi berhemendiya xwe pir mezin e, bi şêweyekî bedew şêwekariyê dike û dikare hestên xwe bi rêka şêwekariyê bîne ziman. Emê hewil bidin ku wê zêdetir bi xwendevanan bidin nasîn û xebata wê derxin pêş. Ew keça ciwan, bi raman û hestan li ser afirandina şêwesazên rind dirawste. Reng û awayên cuda bikar tîne, di encamê de sipehî, ronahî bi awayekî xweşik şêweyan diaferîne, da ku diyardeyên rastîn derxîne holê.

Gelo ew kî ye? Bi nav Danya Mardînî ye, Ew di sala 2007'an de li bajarê Amûdê li Kurdistana Sûriyê jidayik bûye, ji temenekî biçûk ji 9 saliya xwe de dest bi karê şêwekariyê kiriye. Wek tê zanîn ku gelek hunermend xwedî berhemendî û şiyana şêwekariyê ya cewherî ne, lê yên ku ne xwediyê wê berhemendiyê bin, xwe bi perwerdekirina çi bi kurs an bi bernameyên cûrbecûr yên hunerî fêrî şêwekariyê dikin, lê Danya ev berhemendî bi cewherî wergirtiye, û lê xwedî derketiye, ku bibe wek gelek şêwekaran xwedî tabloyên bi nav û deng.





Danya Mardînî wisa ji Rojnameya Kurdistan re dibêje, şêwekarî ne tenê hobî ye, ew dixwaze beşdarî pêşangehên şêwekariyê bibe.

Danya Mardînî, dikare portirêyan şêwe bike. Şêwekariya portirêyê celebeke ku ji bo nasîna mijarek mirovî ya taybetî tê armanc kirin.

Danya wisa axivî:" Rengên hunerî diguhezin, û her celeb bi rengek bêhempa ye ku me dikişîne nav cîhana xwe".

Danya di hunera teşkîlî de jî baş e, ku behsa peykersaziya sê-alî û hunera du-alî dike, wek şêwekirin, û peykersazî û hunerên destan, lewra jê re hunera dîtbarî tê gotin.


Malbata Danya gelek bo wê piştgirin, bi hêzek zêde û bilind, da ku şox û şengiya hunera xwe bigihîne her kesî. Wisa ku jiyan bo Danya bûye pênûs û lênûs. Ew ji bo berdewamiya xwendina xwe digel malbata xwe li Şama paytexta Sûriyê dijî.

## Gezgezk



Dr. Munîb Ehmad

Bi Kurdî:Gezgezk. Bi Latinî:Utrica dioica Bi Erebî القريص. Bi Rûssî:Крапива двудомная. Bi Ingilizî:Urtica. Bi Firensî:Ortie. Giyaki pirsalane ye pelên wê ferehin kûlilkê wê biçûkin li ser pelên Gezgezkê pirçeke zirav û tûj he ye gava li laşê Mirov di kevê di êşênê û di xwerê ji ber vê yekê bi navê Gezgezkê tê naskirin,bi zaroktî me ji ber qeraxê Çema jê dikir û pê me li destê hev dixist wekû yarî. Gezgezk li her derî he ye li Eûrûpa ,Rojhilata Navin,Qefqazê û li vir li Kurdisrana Sûrî he ye . Pêkhateya Kimawî: Pelên Gezgezkê zenginin bi Polivitamina K1(0,2%) vitamin C(ta0,6%) ta 50mr% Kerotinoîd (B-Karotin, Kisantofil, Biolaksantin…..) ,vitamin B2,Osid a miroiya û ta 5%Klorafil,Xwêyên Miniral.Beşê kû wekû derman tê bikaranin Pelê Gezgezkê ne , piraniya Teressê yên Kimawî di Pelê Gezgezkê de cih digrin. Dermanên kû ji Gezgezkê çê dikin Xûnrijinê di rawestenin ji ber kû Hemoglobîn di Xwinê de zêde dikê ji ber vê yekê tê bikaranin ji bo Xûnrijina kû bi Jina re çê dibê bi taîbet piştî Berdanînê her weha ji bo Xûnrijina Nasûrê û hinava. Klorafil ya kû ji pêkhatiya kimawî ya Gezgezkê ye Ceste çalak dikê û Çermê ne saxlem nû dikê her weha ji bo Avitaminozê başe ,wekû Ça yê tê vexwarin û tevlû Giyayên di wekû Pûngê ji bo Qolinca hinava û ji bo çalak kirina tevaya Organê Mirov



## Estêra şevê

Yûsif Cimo

Estêrek şevê di xemlîne
Çi nazdare çi perwîne
Heyv ji şerma winda dibe
Dema şoxa wê dibîne
Porek tarî dû çavin reş
Murcan diran lêv higivîne
Rû geşe cend beşûşe
Kenê wê dermanê birîna
Şenge ciwane li hevhatî
Sipehiye ji axa zêrîne
Bejin zirave sipîndare
Sorgul ji dêman weşîne
Rinde nazike pela çinarê
Can sivike xweşiya jîne
Himbêz firdose bihin rîhane
Nêrgize benefşe û nisrîne
Firîşta bûhiştê periya evînê
Şaxa sidrê xwîn şêrîne
Roniya çavan rehjena dil
Awir tîre min dixîne

